# Kuvarikên jehrawî li Norwêcê

Hem kuvarikên (kivarkên) xwarinê hem jî kuvarikên (kivarkên) jehrawî di daristanê de mezin dibin. Hinek ji kuvarikên herî jehrawî ên li Norwêcê dikarin bişibihin kuvarikên xwarinê yên welatên din.



*Cortinarius rubellus (li aliyê çepê) jehrawî ye û dikare li kêleka kuvarikên xwarinê wekî Craterellus tubaeformis (çar kuvarikên aliyê rastê) bibe.*

**Lîsteya kontrolê ji bo nêçîr kirina kuvarikên ewle**

- Kursa kuvarikzanî bistînin.
- Her tim kuvarikan yek bi yek hilbijêrin û paqij bikin.
- Derbarê kuvarikên Norwêcî û kuvarikên jehrawî ên li Norwêcê de hene hîn bibin. Celeb û cûreyên kuvarikan di navbera welatan û parzemînan de cuda ne. Kuvarikên xwarinê yên li welatên din dikarin bişibihin kuvarikên ku li Norwêcê jehrawî ne.
- Agahiyên nû û rojane der barê kuvarikan de bikar bînin.
- Tenê kuvarikên kalîte baş bixwin. Kuvarikên ku ji aliyê mêrûvekan ve hatine xwarin an jî xirab bûne avêjin.
- Kuvarikên xwarinê divê bi tevahî mezin bûbin an jî taybetmendiyên têrê hebin da ku hûn wan nas bikin.
- Cureyên cûda yên kuvarikan di sepeta xwe de ji hev cuda bihêlin, mînak di konteyner/defirên cuda de.
- Bi tevahî ewle bin ka hûn kîjan kuvarikekan hildibijêrin, dixwin an jî ji kesên din re pêşkêş dikin.
- Kuvarikan bi pisporên kuvarikê an (kuvarikazan) re kontrol bikin, an di navendeka kontrola kuvarikazanî a nêzî we de an jî bi rêya Kontrola Dijîtal a Kuvarikan li ser têlefona xwe ya desta kontrol bikin.
- Qet zîrekiya çêkirî (AI) bikar neyînin da ku diyar bikin kîjan kuvarik ji bo xwarinê bikar bînin.

**Kuvarikên herî jehrawî li Norwêcê**

Kuvarikên di vê broşûrê de dikarin bibin sedema zirarên demdirêj li ser endamên wekî cerg û gurçikan.

Her weha kuvarikên jehrawî ên din û kuvarikên ku ji bo xwarinê nayên pêşniyar kirin jî li Norwêcê hene. Ev kuvarik li vir nehatine behs kirin.

www.soppognyttevekster.no bibîne ji bo agahiyên bêtir derbarê kuvarikên ku dikarin werin xwarin.

*Folkehelseinstituttet, 2026*



### Norwêcî: Hvit fluesopp

*Amanita virosa*

Tevahiya kuvarikê spî ye (gupik, qed/qamişk, fişik û goşt). Li ser qamişkê elqeyek (gustîlek) heye, lê ev dikare bikeve. Beşa jêrîn a qamişkê di nav bergeke(torbekê) de hatiye dorpêç kirin. Ev kuvarik di daristanan de gelek e.



### Norwêcî: Grønn fluesopp

*Amanita phalloides*

Rengê gumikê dikare ji kesk heta qehweyî û zer biguhere. Fişik û qamişk spî ne. Li ser qamişkê elqeyeke (gustîlek) heye, lê ev dikare bikeve. Beşa jêrîn a qamişkê di nav bergeke (torbekê) de hatiye dorpêç kirin. Ev kuvarik li Norwêcê kêm e.



### Norwêcî: Flatklokkehatt

*Galerina marginata*

Gupik û fişik qehweyî-zer in. Qamişk ji gewr heta qehweyî diguhere. Ev kuvarikeka biçûk e ku bi giştî bi kom li ser qelpê darê û qurm/qopikan çê dibe. Ev kuvarik gelek e.




### Norwêcî: Små parasollsopper

*Tuxma Lepiota*

Kuvarikên di tuxma Lepiota de biçûk in û zehmet e ku mirov wan ji hev cuda bike. Nayê zanîn ka kîjan cure di vê tuxmê de dikarin jehrawî bin.

Fişik bi rengê spî ne. Gupik/Kûmik sereke qertişî heye bi rengên cuda.

Qamişk dibe ku elqeyeke (gustîlek) hebe an jî tune be. Qamişk dibe ku spî an jî rengên din be.

Goşt spî ye.

### Jehrxwarin/Jehirîbûn bi Amanita virosa an Amanita phalloides, Galerina marginata an kuvarikên Lepiota

Tewra mîqdarek zêde piçûk ji van kuvarikan jî dikare bibe sedema jehrîbûna cidî. Nîşan piştî 6-24 saetan ji xwarinê xwiya dibin bi zikçûneka avî ya dijwar, êşa mîde û vereşînê. Xetereka bilind a zirara kezebê ya ku dikare bibe sedemê mirinê di nav 2-3 rojan de heye. Heke guman dikin ku jehir hatiye xwarin, ji bo hay karîya pêşve bi Xeta Alîkariya Agahiya Jehrê re têkilî daynin.



**Norwêcî: Spiss giftslørsopp**

*Cortinarius rubellus*

Tevahiya kuvarikê qehweyiyeka sor e (gupik/kûmik, fişik, qamişk û goşt). Ev kuvarik di daristanan de gelek e.



**Norwêcî: Butt giftslørsopp**

*Cortinarius orellanus*

Dişibihe Cortinarius rubellus lê kûmika wê kot e/ne tûj e. Ev kuvarikek kêm/nadir e. Ev kuvarik di daristanên peldar de dibe.

### Jehrîbûn bi Cortinarius (Norwêcî: Giftslørsopp)

Tewra zêde piçûk ji Cortinarius jî dikare bibe sedema zirara cidî li ser gurçikan. Nîşanên jehrîbûnê dibe ku heta herî kêm 36 saetan piştî xwarinê xuya nebin an dernekevin. Nîşan dikarin dilrabûn, vereşîn, êşa mîde, tînîtî, êşa masûlkan, sergêjî, westiyayî û nerehetî ji xwe bigirin. Hinek kes berî ku zirara guçirkan pêk were nîşanên kêm hene. Xetera bilind a pêkhatina zirara cidî ya gurçikan di nav 3-14 rojan de heye.

Heke guman dikin ku jehir hatiye xwarin, ji bo hay karîya pêşve bi Xeta Alîkariya Agahiya Jehrê (Giftinformasjonen) re têkilî daynin.

**Xeta Alîkariya Agahiya Jehrê**

Telefon.: 22 59 13 00

(24 demjimêr vekirî ye)



Komeleya Kuvarik û Riwekên Kêrhatî ya Norwêcê ([www.soppognyttevekster.no](www.soppognyttevekster.no)) kurs û gerên/seferên kuvarikê rêk dixe.

Kontrola dijîtal a kuvarik - [Digital soppkontroll]()

Broşûr ji aliyê Xeta Alîkariya Agahiya Jehrê ve hatiye amadekirin. Agahiyên zêdetir derbarê kuvarikan û jehrbûnê de li [www.giftinfo.no](www.giftinfo.no) berdest in.

Wêne: Per Marstad

Herî dawî hatiye nûkirin li: 2026